# Li Hortenê di ewlehîyê de

## Parastina mirovên mezin yên di xetereyê de



HORTEN
KOMMUNE

# Tûndûtûjîya di nav malbatê de pirsgirêkek civakî ye

**Gelo hûn rastî tûndûtûjî an destdirêjiyê tên an jî hûn guman dikin ku kesek ji 18 salî mezintir e destdirêjî lê tê kirin? Naxwe divê hûn bi TryggEst [SafeEst] ya şaredariyê re bikevin têkilîyê.**

## TryggEst çi ye?

Şaredariya Hortenê şaredariyek TryggEst e. Ev tê wê wateyê ku şaredarî, yekîneyeke nav-sazî ava kiriye ji bo alîkarîkirina balkişandina li ser pêşîlêgirtin, tesbîtkirin û têkoşîna li dijî tûndûtûjî û destdirêjiya li hember mirovên mezin ku kêm an jî qet şiyana parastina wan bixwe tune ye.

Nimûneyên mirovên ku dibe ku bi taybetî ji tundûtûjiyê û destdirêjiyê re xeternak bin, kesên bi xerifîn, astengiyên laşî û derûnî, pirsgirêkên îstismarkirina maddeyan, kal û pîr an mirovên nexweş in.

## Yekîneya TryggEst ya şaredarîya Hortenê

Yekîneya TryggEst ya Şaredariya Hortenê ji nûnerên jêrîn pêk tê:

- Xizmeta Tenduristiya Derûnî û Bikaranîna Madeyan;
- Xizmeta Lênêrîna Malê;
- Sazîya Kar û Alîkarîya Civakî ya Norwêcê (NAV);
- Yekîneya Karkerên Civakê.

Yekîneya şaredariya TryggEst li gorî modela girêdayî Midûriyeta Karûbarên Zarok, Ciwan û Malbatê (Bufdir) li Norwêcê dixebite.

Li Hortenê xebatên li ser asta herêmî ji aliyê siyasî ve hatine pejirandin û di Plana Çalakiyê ya Şaredariyê ya li dijî tûndûtûjî malbatê de cih girtiye.



## Ez kengî dikarim bi TryggEst re bikevim têkiliyê?

Gelek cureyên tûndûtûjîyê û destdirêjiyê hene.  Hin ji van dikarin bi rehetî werin dîtin lê yên din ku wekî destdirêjiya derûnî û destdirêjiya aborî nin dikarin kêm xuya bikin.

Ger hûn guman dikin ku kesek tê destdirêjîkirin, divê hûn bi TryggEst re bikevin têkilîyê da ku vê yekê hûn bigihînin wan.  Nasnameya we veşartî dimîne.

Xebatkarên şaredariya Hortenê jî dikarin bi yekîneyê re bikevin têkilîyê.


## TryggEst çawa dikare alîkariyê bike?

Yekîneya TryggEst, şîretan dide û rêberî dike ji bo karmend û niştecîhan ku nirxandin û pêkanîna tedbîran bicîh bîne.

## Têkilî

Hûn dikarin bi yekîneya TryggEst ya şaredariya Horten re bikevin têkiliyê: 482 65 307.

Rojên Duşem, Çarşem û Înê di navbera 10.00-14.00an de bi telefonê xizmet tê dayîn.



## AGAHÎYÊN TÊKILIYÊ
## YEKÎNEYA TRYGGEST YA ŞAREDARÎYA HORTENÊ

**Hejmara Telefonê: 482 65 307.**

**Rojên Duşem, Çarşem û Înê (10.00-14.00).**

## XIZMETÊN DIN YÊN PIŞTGIRÎYÊ

**Di rewşên tûndûtûjîya lezgîn de:**
Li ser hejmara 02800 bi polîs re bikevin têkiliyê

**Di rewşên hewcedarî yên parastin û axaftin û şîret/rêberî de:**
Hûn dikarin li ser hejmara telefonê 33 35 91 91 bi Navenda Krîza Vestfoldê (Xênîya penaberîyê) re bikevin têkiliyê

**Heke gumanek we ji bo zarokan hebe:**
Li ser hejmara telefonê 95 19 35 10 bi Sazîya Parastina Zarokan re bikevin têkiliyê.
(Demjimêrên vekirî di navbera 9:00 sibê û 15:00 piştî nîvro ye).
Li derveyî demjimêrên xebatê:
Li ser hejmara 33 31 02 03 bi Yekîneya Rewşa Lezgîn a Parastina Zarokan re bikevin têkiliyê.

TryggEst.no
Bufdir

HORTEN
KOMMUNE